

hewldanên Tirkiyeyê hemî li ser asteng kirina Kurdan bo bidestnexistina azadiyê ne.

Kovara BÎR: *Dema ku em bala xwe bidin li ser rewşa giştî ya Rojhelatanavîn, guhartinên li herêmê û rewşa Îran, Surye û Kurdîstana Suryeyê bînin ber çavê xwe, di demeke nêzîk de bi taybetî ji bo kurdên Surye û bi giştî jî ji bo kurdên din, paşerojekê çawa li benda (pawiga) me ye?*

-: Li Rojhilata navîn, tekoşîna li hember dîktatorên 'Ereb, bi awayekî rûxandina dîktatoriyan, di dîroka Rojhilata Navîn de pêngaveke girîng e. Ez bawer im ev pêvajo hem li ser Kurdên Suryeyê û hem jî li ser hemû Kurdên ku li Rojhilata Navîn dijîn bandoreke girîng û pozîtîf bike. Li vir tiştê girîng ev e: Divê Kurd di pêwendiyên xwe yên bi Konseya Muxalefeta Netewî an bi rejîma Beşşar Esad re li ser berjewendiyên xwe î netewî rawestin û wek peyman bidin nivîsîn. Bêgûman hevdiîtinên bi rejîma Beşşar Esad re, ne bo girêdana bi rejimê re, belkî bo bidestxistina berjewendiyên netewî divê bîn kirin. Bêgûman divê bi daxuyaniyên devkî yên Konseya Muxalefeta Netewî û Rejîmê neyê bawerkirin. Bi vî awayî lezkirina Kurdan jî ne pêwîst e.

Ev rewşa îroyîn çî qas bidome, bo Kurdan dê encamên baştir derxe holê.

Kovara BÎR: *Muhalefeta (opozîsyona) Surye di têkilîyên navnetewî de, êdî wek muhatabek meşrû tete dîtin. Lêbelê muhalefetê hetanî vê gavê di derbarê Suryeya piştî Beşşar Esad de, bi taybetî jî li ser mesela netewî ya kurdên li Surye, bernameyêke siyasî ya aşkere dîyar*

nekirîye yan jî bernameyêkê wan ê wisa nîne. Li gor dîtina we, divê çarçoveya têkilîyên aliyê kurd û opozîsyona ereb çî be û li ser kîjan esasan be?

-: Ji hêzên girîngên ku piştevaniya Muxalefeta 'Ereb a Suriyeyê dikin belkî hêza sereke Tirkiye ye. Tirkiye ji bo ku Kurd tu sûd ji vê guherînê nebînin piştevaniya Muxalefeta 'Ereb dike. Polîtîkaya bingehîn ya Tirkiyeyê ew e ku bibe asteng li hember statu bidestxistina Kurdan. Civînên Muxalefeta 'Ereb yên li Antalya û Stenbolê astengkirina Kurdan bo vî awayî girîng hatiye dîtin. Muxalefeta 'Ereb, jiber piştevaniya Tirkiyeyê piştî Beşşar Esad di derbarê Kurdan de polîtîkayek nikare diyar bike. Lê, diyar bûye ku bê Kurdan jî gihastina encamek nepêkan e. Jiber vî awayî KNS, hinek sozan dide Kurdan....

Kovara BÎR: *Di derbarê vî mijarê (babetê) de gotina we ya dawî çî ye?*

-: Kurd, di Rojhilata Navîn de, ji çil milyonî zêdetir in. Lê, di pêwendiyên navnetewî de xwedî statuyêke siyasî bi rûmet nînin. Bes navê Kurdan dema behsa "terorê" bê kirin derbas dibe. Koma navnetewî, bo bêstatûbûna Kurdan neguhere, bi vî awayî bidome, di nava hewldanên mezin de ne. Ev tê wateya ku di salên 1920an de, di serdema Koma Miletan de tûrê bilanet li serê Kurdan hatiye daxistin. Rêveberiya Herêmiya Kurdîstana Başûr divê cihê bê nixandin. Di dunyayê de, îro, 208 dewlet hene. Ji van dewletan çil jê serjimara wan, nagihîje milyonekî. Di saziyên wek NY de, di Konseya Ewropayê de, di **D.R.(4)**

Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re , yên di girtîgehên Sûriyê de